

ÎXLALÊN MAFÎ YÊN LI GIRTÎGEHA ÎMRALIYÊ YA SALA 2017an û RAPORA TESPÎTÊ YA TEKÎLDARÊ REWŞA HEYÎ û PÊŞVEÇÛNAN

I. DESTPÊK

Ji 15-20ê Tîrmeha 2016an hemberî-derbê bi mekanîka derbeyê Rewşa Derasayî (OHAL) û Biryarnameya di Hikmê Qanûnê de (KHK) bû pergala rêvebirinê û heta niha salek û niv derbas bû. Ev pêvajoya ku ji derfetên rêvebirina demokratîk dûr hatiye ketin wekî mafên bingehîn û azadî hatine hilawestin di bingeha xwe de gelek maf jî hatine mevred kirin û heta ji holê hatine rakirin.

Di vê wateyê de di sala 2017an de muwekîlên ku li Saziya Înfaza Cezaya ya Tîpa F ya bi Ewlehiya Bilind a Îmralityê de ne **Birêz Abdullah Ocalan, Birêz Hamîlî Yildirim, Birêz Veysî Aktaş û Birêz Omer Hayrî Konar** mafê wan ê bi hevdîtina parêzeran, mafê hevdîtina endamên malbatê, mafê bi hevdîtina telefonê, mafê bi hevdîtina name, faks û her cure amûrê ragihandinê û çend mafên din ji holê hatiye rakirin. Ev rewş di heman demê de carek yan jî carekê zêdetir îxlala mafan wêdetir “tecrîda rasteqîn” a tê wateya îşkenceya bi sistematîk pêk tîne. Di vê çarçoveyê de Girtîgeha Girava Îmralityê ku qada herî zêde û herî kûr “qedexeya îşkenceyê” tê îxlalkirin e, her roja ku derbas dibe gumanên li ser parastina muwekîlan tê kirin yan nayê kirin zêdetir dibe .

II. SERÎLÊDANÊN JI BO HEVDÎTINA GIRTÎGEHÊ HATINE KIRIN

Di 27ê Tîrmeha 2011an de piştî hevdîtina parêzeran ya dawî hemû hevdîtînan muwekîl û parêzeran bi şiklekî dijhiqûqî bi binasiyên cur bi cur hatiye astengkirin. Hemû daxwazên hevdîtînan yên parêzeran ku rojên Çarşem û Înê di hefteyê de du rojan pêk dihatin biryara bi binasiya 1 emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê dîroka 21.07.2016 û bi hejmarê 2016/56 Karê Cuda hatiye nîşandan û hatiye redkirin. Biryara bûye mijar ligel her çar muwekîl jî cezaxwar in qanûna bi hejmarê 5275, girtiyên ku cezaxwarine li ser wan pêkanîn ne mimkun e xwe dispêre rêgeza 114/2-3, 115/1-b yê. Li ser îtirazan jî di sîc û cezayê de dijberê hêmana qanûnî yê bi hejmarê 667 KHK rêgeza 6/d yê ku piştî hatiye weşandin bi otomatîk xwe spartîye. Li gorî vê biryarê **di dema rewşa awarte de** ragihandina bi nivîskî, tekîliya ji derve re were danîn û qebûlkirina serdêran ji bo muwekîlan hatiye qedexekirin. Di pêvajoya rewşa awarte ku demekê bê pêşbînî û nayê terîfkirin di hundirîne, girtiyên ku di girtîgeha giravekî îzolekirî de ne xespkirina mafê wan ê bingehîn û azadiya wan nayê qebûlkirin. Di encamê de serdanên ku li girtîgeha Îmralityê tên kirin bê hiqûqî û kêfîyet bi şiklekî bêperwaz didome. Di sala 2017an de **100 daxwaza serdana parêzeran û 44 daxwaza serdana malbatan** bi tevahî biryara Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê bi şiklekî kêfî bi binasiya mijarê hatiye redkirin. Tekîldarê vê rewşê xeynî Birêz Ocalan sê girtiyên ku ji girtîgeha Îmralityê re hatine neqilkirin roja ku çûne girtîgeha Îmralityê heta îro bi malbat û parêzerên xwe re hevdîtînan pêk neanîne.

Ji xeynî malbat û parêzeran parlementerên Parlemantoya Ewropayê yên ji welatên cur bi cur, heyeteke di nav de akademisyen û çalakîkerên mafê mirovan yên navnetewî jî hebûn ji Wezaretê Dadê daxwaza randevû hatiye kirin xwestine 17-18-19ê Sibata 2017an de serdana Girtîgeha Îmraliyê bikin lê belê ev serlêdan bê bersiv hatiye hiştin.

Dîsa ji ber sedema Cejna Qurbanê ya 2017an di bergeha mafê zagonê de ji bo hevdîtina cejnê pêk were ji bo di dîrokeke guncav de hevdîtin pêk were endamên malbatê di navbera 28ê Tebaxê û 4ê Îlonê de ji bo hevdîtinê serî li Serdozgeriya Komara Bûrsayê re dane. Serdozgerî ji vê yekê re bersiveke neyînî daye.

Di zemîna ku pergala Tecrîdê ketiye halekî mayînde bi taybetî ji bo Muwekîl Birêz Ocalan ji ber nasnameya wî ya politik gelek nûçeyên diyar û ne diyar derketine holê. Di 13ê Cotmeha 2017an de di malpereke nûçeyan yê internetê de tekîldarê jiyana Muwekîl Birêz Ocalan hinek nûçe hatine weşandin. Hema ji hêla Serdozgeriya Komara Bûrsayê ve daxuyaniya çapemeniyê ya bi vî şiklî hatine parvekirin nûçeyên bûne mijar “ nûçeyên rast nîn in” . Derketina vê nûçeyê û nûçeyên dişibin pê bêguman girêdayî pêşveçûnên siyasî yên li welat diqewimîn û girêdayî vê yekê nediyariya rîya tecrîda rasteqîn e. Li ser vê yekê serlêdanên endamên malbatê ku nikarin hevdîtin pêk bînin û diltirsiya wan heye û serlêdanên parêzeran jî wekî serlêdanên din hatiye redkirin. Di 16ê Cotmeha 2017an de parêzeran tekîldarê nûçeyan û li ser diltirsiya ku li ser rewşa Muwekîlê wan zêde bûye serlêdanên hevdîtinê yên tekîldarê vê yekê ji hêla Serdozgeriya Komara Bûrsayê ve, biryara lemîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê dîroka 21.07.2016 û hejmara Kar 2016/56 D. ve binasî hatiye nîşandan û hatiye redkirin. Dîsa di 16ê Cotmeha 2017an de serlêdana hevdîtina endamên malbatê yên heman diltirsiyê bi heman binasiyan hatiye redkirin.

Li hemberê Tecrîda Îmraliyê ku pîvanên hiqûqê yên giştî, azadî û mafên bingehîn bi şiklekî bi pergalê tê îxlalkirin, nîrxên civakê yên ehlaqî tune tê hesibandin, û vegeriya rejîma ku tevgera heyî tune tê hesibandin hiqûqnasên bi baroyên cuda yên li Tirkiyê ve qeydkirîne û parêzer jî ji bo bi Birêz Ocalan re hevdîtin pêk bînin serî lê dane. Encax di 24ê Mijdara 2017an de serlêdana 250 parêzeran ku bi hev re kirine ji hêla Serdozgeriya Komara Bûrsayê ve, biryara lemîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê dîroka 21.07.2016 û hejmara kar 2016/56 D. binasî hatiye nîşandan û hatiye redkirin.

Ji bo bi hurguliyên pergala tecrîdê ku hatiye halê mayînde were axaftin dan û stendina zanistî were kirin û rejîma Tecrîda Îmraliyê ku dijberê zagonan e ji holê were rakirin bi berpirsiyarê hiqûqî û siyasî Wezîrê Dadê re daxwaza hevdîtinê hatiye kirin. Bi taybetî piştî nûçeyên ku tekîldarê jiyana Birêz Ocalan hat belavkirin ji Wezîrê Dadê di 16.10.2017an de daxwaza randewûyê hatiye kirin. Encax ji daxwaza hevdîtinê re tu bersivê nehatiye dayîn. Daxwaza hevdîtinê di 12.14.2017an de ji Wezaretê Dadê re hatiye kirin heta îro jî hîn bê bersiv e.

III. NIKARIBÛNA BIKARANÎNA MAFÊ AGAHÎGIRTIN û RAGIHANDINÊ

Wekî tê zanîn bi Birêz Abdullah Ocalan re parezerên wî herî dawî di 27ê Tîrmeha 2011an de karibûn hevdîtin pêk bînin. Piştî hevdîtina bi şandeya HDPê re 5ê Nîsana 2015an de pêk hatibû tenê hevdîtinek piştî greva birçibûnê ku 50 sîyasetmedarên Kurd pêk anîbûn di 11ê Îlona 2016an de hevdîtina malbatan pêk hatibû. Piştî vê hevdîtinê ji Birêz Ocalan û sê muwekîlên din bi name, birûske yan jî bi faksê bi tu şiklî agahî nehatiye girtin bi heman şiklî ji derve jî ghiştina bi riya postayê gengaz nebûye.

Parêzer di 2ê Hezîrana 2017an de ji bo muwekîlên xwe Ocalan agahî bigirin hem jî di derheqê doza ku di Dadgeriya Îdareya Atînayê de bi daxwaza xwe vekiribû bibin xwedî zanîn nameya ku li ser qenala Serdozgeriya Komara Bûrsayê şandibû heman encam hat jiyîn. Wekî ji vê nameyê bersiv nehat girtin, di derheqê ghiştin û neghiştinê de jî zanîneke fermî bi dest neketiye. Herî dawî di 29ê Berfanbara 2017an de dîsa ji hêla parêzeran ve jê re ji bo parvekirina rewşa hiqûqî ya heyî û nameya ku pê re hatibû şandin hîn jî ne diyariya xwe diparêze. Ji bo alikariya hiqûqî hevdîtina parêzeran ya rû bi rû ya muwekîlên wan ên li Îmralityê ne mijara peyvêye; ji bo dozên didomin danîna temasa bi riya postayê jî nabe. Ji muwekîlan re mafê telefonê ku deh hezaran girtî û cezaxwarên ku li girtîgehên din in pêk tînin ev maf tucar ji bo wan pêk nehatiye.

IV. HELWESTA KOMÎTEYA PÊŞÎLÊGIRTINA ÎŞKENCEYÊ (CPT)

Di dema tecrîda mutleq de parêzeran, bi saziya Şûraya Ewropayê ku Tirkiye jî emdam e û serlêdanên girtîgehên dewletên endam dike, tekîldarê îxlalên mafî yên tespît dike mafê amadekirina raporên pê re heye bi Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê (CPT) re hevdîtin û agihandinên pêwîst her tim hatiye kirin. Herî dawîyê di 28-29ê Nîsana 2016an de CPT ji Girtîgeha Îmralityê re serlêdan pêk anîye, dijberê serdanên şeş meh berê tekîldarê vê serdanê rapora pêşniyaz û tespît cih digirin ligel di ser de 21 meh derbas bûne bi binasiya tasdîqa Tirkiyê nehatiye girtin nehatiye weşandin. CPT ya ku di raporên xwe yên tekîldarê serdanê xwe yên berê de li Girtîgeha Îmralityê gelek tespîtên îxlalên mafan kiriye û ji bo ev werin dîtin û werin çareserkirin pêşniyazên cur bi cur kiribû êdî îro li hemberî rewşa agahî negirtina mutleq de bêdeng mayîna wî nayê fahmkirin. CPT di dîrokên 29ê Tebaxê- 6ê Îlona 2016 û 10-23ê Gulana 2017an de li Tirkiyê serdana gelek girtîgehan kiriye û neçûna Girtîgeha Girava Îmralityê çavdêriya di mijara Îmralityê de lihevhatinek heye derdixe holê.

Di navbera 2017an de ji CPTyê re rewş û bûyerên sîyasî û hiqûqî û hemû pêşveçûnên bi Birêz Ocalan û Girtîgeha Girava Îmralityê re eleqedar, bi şiklê raporên tespîtê yên demî hatiye pêşkeşkirin. Di vê wateyê de pêşveçûnên di navbera 25ê Mijdara 2016 û 20ê Nîsana 2017an de, pêşveçûnên di navbera 21ê Nîsana 2017an û 7ê Tîrmeha 2017an de, pêşveçûnên di navbera 12ê Tîrmeha 2017an û 1ê Mijdara 2017ande, û pêşveçûnên di navbera 1ê Mijdara 2017an û 31ê Berfanbara 2017an de û raporên tespîtê yên demî ku rewşa heyî vedibêje ji CPTyê re hatiye pêşkeşkirin û di hevdîtinên rû bi rû de jî hatiye vegotin.

Ji 15ê Sibata 1999an vir ve di dîrokên 2001, 2003, 2007, 2010, 2013 û 2016an de (rapor nehatiye weşandin) CPT serdana Girtîgeha Girava Îmraliyê kiriye, mercên îşkencê û tecrîdê tespît kiriye û pêşniyara ev merc werin rastkirin û ji holê were rakirin hatiye kirin. Piştî serdana dawî li Tirkîyê hewldana derbeyê pêk hatiye tekîldarê Birêz Ocalan gelek nûçeyên krîtîk ji çapemeniyê re hatiye dayîn, hatiye rewşa welatekî bi OHALê tê rêvebirin, Makeqanûn di kirinê de li derve hatiye hiştin, qedexeya parêzeran şeş sal û nîvan li pişt xwe hiştine, ligel ku 16 meh in ji Girtîgeha Giravê agahiyek jî nehatiye girtin CPT hewldaneke biçûk jî nekiriye.

Em dixwazin bi bîr bînin ku; CPT, hêla Peymana Pêşlêgirtina Îşkenceyê ya Ewropayê (AİÖS) di nava qada desteseriya dewletan de, di encama sêxberiya eqmên giştî yê kesan de cihên ku ji azadiya xwe bêpar mane û tînin girtin serdana hemû cihan; yanî di van cihan de xwediyê desthilatiya vekolîn, lêkolîn û kontrole ye. (AİÖS Md 1,2,7) dewletên alîgir binbarên ji destûr dayîna serdanên Komîteyê re û bi hevkarîya Komîteyê re ne. (Md. 2,3) Tirkîye, AİÖS) di dîroka 11.01.1988an de destnîşan kiriye. Ji bo Tirkîyê dîroka merîyetê dîroka ku mercên pejirandinê pêk hatiye 01.02.1989an e. Di vê wateyê de Tirkîye, desthilatiya CPTyê ji serî heta niha nas kiriye û qebûl kiriye; bikarneanîna desthilatiya CPTyê elemeta di rejîma Tecrîda Îmraliyê de di nav hevkarîyê de ne.

Rapora serdanê ya CPTyê danekirina eşkerekirina bi aliyekî erka wî ya bi vî şiklî ‘‘ Ji Rayagiştî re bangawazî’’ heye. Rêgeza 10/2. AİÖS ê ; ‘‘ *aliyê tekîldar bi dewletê re hevkarî neke yan jî li gorî pêşniyarên komîteyê başkirina rewşê red bike, piştî ew alî ji dewletê re nêrinê xwe vebêje, Komîte di derheqê wê mijarê de ji bo ji rayagiştî re daxuyanî bide bi piraniya ji sisiyan dudu yê endamê xwe re dikare biryar bide’’ . Bi vî şiklî mercên daxuyaniya rapora Komîteyê ya serdana Girtîgeha Girava Îmraliyê dîroka 28-29ê Nîsana 2016an dihewîne. Raporên kul i ser serdana 2010an û 2013an de hatine amedekirin ligel pêşniyar bi cih nehatine û mercên xirabtir pêk hatine jêrevîna bikaranîna vê erke dide fikirîn.*

V. DOZÊN DIDOMIN Ê HEWLDANÊN HIQÛQÎ

Ji bo tecrîda ku li Îmraliyê pêk tê rewabikin car bi caran dewlet û erkdarên hikumetê ‘‘ Ocalan cezaxwar e, dozên wî yê didomin tune ne, ji ber vê yekê nikare bi parêzerên xwe re hevdîtin pêk bîne’’ guherandinên bi şiklî bûne mijara vegotinê. Li gorî mewzûata netewî û navnetewî cezaxwar be jî parêzer her tim xwediyê maf û erka hevdîtina bi muwekîlê xwe ye, xeynî girtîtiyê xwedibûna hemû mafên bingehîn û azadiyê rastiyekî hiqûqî ye. Çiqas tekîliya girtî û dinyaya derve were qûtkirin xetereya miameleya xirab û îşkenceyê ewqasî zêdetir dibe. Mafê hevdîtinê û şewirîna bi parêzeran pêşgiriya di rewşên wisa de amûreke giring e ji bo bi merca tevgara li gorî qeydeyê hiqûqî temînatekî giring e. encax ligel vê yekê di pêvajoya rejîma înfazê de rejîma înfazê taybet ya tu mafî nas nake hatiye damezrandin. Ji ber vê yekê gelek serîlêdanên Birêz Ocalan yê li ber merciyên dadgeriyê derdest bûne heye. Tekîldarê bêhiqûqiyên Birêz Ocalan û muwekîlên din rû bi rû dimînin serîlêdanên netewî û navnetewîyên htine kirin bi vî şiklî ne;

A. Serîlêdanên di Dadgeha Makeqanûnê û Hiqûqa Navîn de Derdest bûne:

1-Birêz Ocalan, roja ku bi komployeke navnetewî xistine Girtîgeha Girava Îmraliyê û heta niha tu carî di nexweşxaneyê baş de ji bo mafê tenduristiyê feyde negirtiye. Ji 18 salan vir ve ji hêla parêzeran, malbatê û heyeta tenduristiya serbixwe ya rayagiştîya demokratîk ve ligel daxwaza lînêrîna tenduristiyê hatiye kirin nehatiye qebûlîkirin û qet ji Girtîgeha Girava Îmraliyê nehatiye derxistin. Li gorî Zagona Înfazê bi hejmara 5275 rêgeza 25 emîn pirsgirêkên tenduristiyê ku di mercên înfazê de nehatine çareserkirin di nexweşxaneyê baş a dewletê yan jî di heman mercan de di nexweşxaneyê zanîngê de ligel tedawîkirin gengaz û mecbûrîye jî Birêz Ocalan û Muwekilên din ji vê mafê feyde nagirin. Di vê wateyê de gihîştina mafê tenduristiyê û ji bo qedexeya parêzeran ku bi salan e didomin di 12ê Tîrmehê 2013an de ji Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê re serîlêdan hatiye kirîye. Li ser redkirina serîlêdanan di sala 2015an de ji Dadgeha Makeqanûnê re, qedexeya îşkenceyê, mafê ewlehî û azadiyê, mafê darizandina bidalet, mafê serîlêdanên bi bandor, mafê parastin û veşartina jiyana taybet, û îxlalkirina qedexeya cîhekariyê bi daxwaza werin tespîtîkirin bi hejmara serîlêdanê ya **2015/12433** re serîlêdana takekes hatuye kirin lê belê hîn nehatiye encamkirin.

Di 28.07.2017an de li çapemeniyê, “*bijîşkê Apo yê Girava Îmraliyê ’ Meleyê Fetoyê’ derket*” piştî nûçeyên bi vî şiklî mafê tenduristiya muwekil Birêz Ocalan li gorî hiqûqê bi cih tê anîn yan na ji bo were kontrolkirin nusheya dosyaya tenduristiyê “ *wî erê kirîye*” bidin parêzeran ji Serdozgeriya Komara Bûrsayê hatiye xwestin. Ji sala 1999an vir ve careke jî di nexweşxaneyê xweser û baş de ligel nehatiye tedawîkirin ji dosyaya wî ya tenduristiyê bi binasiya “ *di esasiya veşartina jiyana taybet de ye*” nehatiye dayîn. Ji dosyaya tenduristiyê re mafê girtî bi xwe û wekilên ku ew dixwaze bigihîje heye pivana veşartina jiyana taybet hatiye beravajîkirin û gerîndeyê girtîgehê dikare bigihîje vê dosyayê.

2-Li ser dîroka 27ê Tîrmeha 2011an de salek derbas bûye di dîroka 05.11.2012an de ji Dadgeriya Înfaza ya Bûrsayê re, ji bo mercên girtîgehê hiqûqê pêk were û ji bo mercên hevdiîna parêzeran pêk were serîlêdanên hatine kirin piştî demekê dirêj bersiva redkirinê hatiye dayîn. Ev serîlêdan wekî serîlêdanên li jor ji Dadgeha Makeqanûnê re, qedexeya îşkenceyê, mafê ewlehî û azadiyê, mafê darizandina bidalet, mafê serîlêdanên bibandor bi daxwaza tespîtîkirina îxlala qedexekirina cîhekariyê hejmara serîlêdana **2015/11221** girtiye. Dadgeha Makeqanûnê tekîldarê vê serîlêdanê biryareke nedaye.

3-(a) Eşkerekirina OHALê bi dîroka 20ê Tîrmeha 2016an, pêkanîna xwe ya ewil li Girtîgeha Girava Îmraliyê nîşan daye û di beşa II. a rapora me de tiştên ku hatine vegotin bi biryara lemîn Dadgeriya Înfaza Bûrsayê ve hatiye xwestin deriye Îmraliyê bi tumî were girtin. Îtîrazên ku ji bo biryara vê pêkanîna tu aliyê wê ya hiqûqî tune ye were rakirin hatiye redkirin. Pişt re ji Dadgeha Makeqanûnê re maf û pêkanînen di rêgezên Makeqanûnê 17, 20, 22, 36, 13,15 û 18 emîn de cih digirin ji bo tespîtîkirina îxlalên hatine kirin di **27ê Cotmeha 2016an** de serîlêdan hatiye kirin.

b) Di dîroka 06.10.2017an de bi navbenkariya Serdozgeriya Komara Bûrsayê ve ji Wezareta Dadê re ji bo biryara lemîn Dadgeriya Înfaza Bûrsayê ji holê were rakirin

xirabkirina ji bo feydeya zagonê ji riya zagonê ya awarte re serîlêdan hatiye kirin. Heta ji pêvajoyên temyiz û îstînafê derbas nebûye û hatiye teqezkirin lê belê bi tu zagonê re li hev nayê, hûndirandina lihevkerinek maddî û biryara qanûnî ya qedexeya îşkenceyê bi şiklekî mutleq qul dike, wekî biryara zagonî ya her demî û derbasdar bimîne li ser navê mafên bingehîn û azadiyê ne gengaz e. Wezareta Dadê ku em bende bûn piştî vekolînê tespîta rewşê bike, ji bo biryar ji holê were rakirin serîlêdana ji Dadgeha Bilind re hatiye halê pêwîst. Encax di vê mijarê de tu pêşveçûnek nehatiye jiyîn.

c- Li ser raporên ku me berê dabû xuyakirin Pergala Tecrîdê ya Îmraliyê 1 emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê ku bûye avahîsaza saleke û nîv a dawî nelihevkerina binasîyên maddî û palpiştên biryarê xetayekî hiqûqî nîn e. Ligel tu pîvanga hiqûqê rê nade pergala tecrîdê ya ku heta îro tê meşandin te xwestin bi destê dadgeriyê were halê mayînde yan jî wekî piştguhkirin erke xirab bikaranîn (TCKmd 257) , astengkirina bikaranîna maf û piştguhkirina erke (TCK md 298) dikeve bergehên van sûcan. Di dîroka 21.08.2017an de 1 emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê ku biryarê daye, di derheqê serok û endamên 2 emîn Dadgeha Giran a Cezayê ya Bûrsayê de ji Lijneya Dozger û Dadgeran re bangawaziya sûcê kiriye. Dîsa di heman dîrokê de biryara ku me qal kir bi şiklekî vekirî ligel ne rastkirina “sînardarkirina parêzeran” Serdozgeriya Komara Bûrsayê, biryarê wekî binasî nîşan dide sedema ku 14 meh in serîlêdanên hevdtîna parêzeran red dike di derheqê dozger de di astengkirina mafê daxwaznameyê de (TCK md 121) Erkê xirab bikaranîn (TCK md257) û astengkirina bikaranîna mafan (TCK md.298) di bergeha van sûcan de ji Lijneya Dozger û Dadgeran re bangawaziya sûcê hatiye kirin. Lê belê div ê mijarê de tu pêşveçûnek nehatiye jiyîn.

d- Di dîroka 19.10.2017an de ji 1emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê re di çarçoveya Qanûna Dadgeriya Înfazê bi hejmara 4675 û Qanûna Înfazê bi hejmara 5275 de, ji bo pergala tecrîdê ku di Girtîgeha Îmraliyê de hatiye halê mutleq bi dawî bibe serîlêdan hatiye kirin. Lewra wekî Makeqanûn û pêwîstiyên berpirsiyariyên navnetewî, tê zanîn ku erka tu merciyên dadgeriyê erka wan a îxlalkirina qedexeya îşkenceyê tune ye. Qanûna Dadgeriya Înfazê bi hejmara 4675, ji Dadgeriya Înfazê re binbariya girtîgehan û kesên ku di nav de ne ji îşkenceyê û parastina tecrîdê bar dike. Di vê wateyê de ji bo mercên îşkenceyê bi dawî bibin ji serîlêdanê re, 1emîn Dadgeriya Înfazê ya Bûrsayê bi hejmara biryara kar a guhertî 2017/1 re; ‘*di derheqê cezaxwarên li Saziya Înfaza Cezayê ya Girtî û Bi Ewlehiya Bilind a Îmraliyê biryara Dadgeriya me ya di dîroka 21.07.2016an de û bi hejmara kar a guhertî 2016/56 û di encama vekolîna îtiraza vê biryarê de biryara 2 emîn Dadgeriya Cezayê Giran a Bûrsayê di dîroka 26.07.2016 û bi hejmara kar a guhertî 2016/1127 rewşa binasîyê pêk tîne guhertinek tune , li welatê me rewşa derasayî didome hejmara 667an ya Biryarnameya di Hikmê Qanûnê de rêgeza 6/6, Qanûna bi hejmara 5275 114/2-3, 115/ 1- b û 59/5-6 (bi hejmara 667 ya KHKê zêdekirina bi rêgeza 6 emîn) bi van rêgezan ...bi binasîyên bi vî şiklî daxwaza me hatiye redkirin. Rêgezên Qanûnê yên ku girtiyan esas digire û wekî hev in ligel binasîyeke din neketiye holê îtiraza ku me kiriye, ji hêla 5 emîn Dadgeriya Cezayê Giran a Bûrsayê ve bi biryara hejmara kar a guhertî 2017/1631 ve bi binasiya ‘*ji zagonê re cihêkarî nehatiye dîtin...*’ hatiye redkirin.*

e- Di dîroka 19.10.2017an de serdana muwekîlan, vekolîna mercên girtîbûnê, rapor were girtin tekildarê ji bo merc li gorî hiqûqê were guncankirin ji **Saziyên Înfaza Cezayê ya Bûrsayê û ji Lîjneya Şopandina Girtîgehê re** serlêdanek hatiye kirin. Lê belê di vê mijarê de pêşveçûnek nehatiye jiyîn. Lewre di çarçoveya Rêvebirina Lîjneya Şopandina Girtîgehê û Saziyên Înfaza Cezayê de herî kêmtir du mehan careke divê serdana girtîgehan bikin û tekildarê van serdanan raporên xwe 4 mehan careke ji bo di malpare fermî ya Wezaretê Dadê de were weşandin ji Wezîrê Dadê re were şandin dîsa ji Serokatiya Komîsyona Vekolînê Mafê Mirovan ya Parlemantoya Gelan a Mezin re, ji Serdozgeriya Komarê ya di nav Lîjneya Şopandinê de ye û yê dikevin qada erkê gava mijareke giliyê hebe mecbûre ku bişîne Dadgeriya Înfazê.

4-Di salên 2003,2004, 2006 û 2007an de çar serlêdanên cuda yê Birêz Abdullah Ocalan ku ji Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropayê hatiye yekkirin di dîroka 14ê Adara 2014an de bi aweyekî çar dosyayên bi hev ve wekî dosyayek biryar li ser hatiye dayîn, di 18ê Adara 2014an de biryar hatiye gotin. AÎHM hinek rêgezên daxwaza hikmê îxlalê hatiye kirin qebûl kiriye nirxandina hinek rêgezên din jî nekiriye. Îtîraza ku ji Daîreya Mezin re were kirin wekî 3 mehan dema ketina mafê heye, di derheqê biryar û naveroka biryarê de di babeta mafê parastinê ya parêzeran de ji bo bi Birêz Ocalan re hevdîtin pêk were bi daxwaza pêşgiri were girtin serlêdan hatiye kirin. Dadgeha Makeqanûnê di derheqê esasa dosyaya bi hejmara **2014/5264** biryar nedaye û hîn biryara daxwaza pêşgiriye jî nedaye.

5- Piştî 15ê Tîrmeha 2016an ji hêla gelek çavkaniyan ve Girtîgeha Îmraliyê û Muwekîl Birêz Ocalan ji hêla leşkerên derbekar de bûye hedef gelek caran hatiye vegotin. Ev rewş di mijara ewlehî û tenduristiya Birêz Ocalan de rayagîştî bi mafdarî bûye xwediyê diltirsiyê. Ji bo ev diltirsî werin derbaskirin bi armanca hevdîtin bi lez û bez pêk were bi daxwaza pêşgiriya zêde serlêdan hatiye kirin. Ji hêla Dadgeha Makeqanû ve daxwaza pêşgiriye hatiye redkirin, tekildarê bingehê hîn biryar nehatiye dayîn.

6- Azadiya ragihandinê ya ku ji azadî û mafê bingehîn a Birêz Ocalan e, mafê azadiya vegotinê û ji jiyana taybet re rêzdarî di heman demê de mafê hevdîtinê ya bi telefonê bi parêzeran re jî dihûndirîne. Encax bi sedema ji vê mafê bêpar hatiye hiştin di **Îlona 2016an** de serlêdana ji Dadgeha Makeqanûnê re hatiye kirin didome. Bingeha serlêdanê astengkirina daxwaza Birêz Ocalan bi parêzerên xwe re bi telefonê hevdîtin pêk bîne ji holê were rakirin. Di serlêdana hatiye kirin de qedexeya îşkenceyê di Peymana Mafê Mirovan a Ewropayê, veşartîbûna jiyana taybet û mafê ji jiyana taybet re rêzdarî û tespîtkirina îxlala mafê azadiya vegotinê tê daxwazkirin.

7-Bi girantirîn mercên Girtîgeha Girava Îmraliyê ku êdî nayê idarekirin sînordar nehatiye mayîn, ketine pêşiya gihîştina mafê zanîn û ramana civakê jî bi binasiyên bêmaf biryara qedexeya li ser gelek pirtûkên Birêz Ocalan hatiye dayîn. Pirtûkên Birêz Ocalan bi navê ‘‘ Uygurlik’’, ‘‘Kapîtalîst Uygurlik’’, û ‘‘ Ozgurluk Sosyolojîsî’’ ku wekî parastin daye AÎHMê mafdarî û eşkerebûna navnetewî pêk hatiye ji bo biryara qedexeyê û komkirinê ya ji hêla 1emîn Dadgeriya Cezaya Sulhê ya Wanê (Dadgeriya kevin ya bi hejmara 1emîn) ve hatiye dayîn ji bo were rakirin di **15ê Sibata 2016an** de serlêdana ji Dadgeha Makeqanûnê re hatiye kirin berdawame. Li hemberî qedexeya pirtûka pêncemîn a vê

parastinê, ji hêla Dadgeriya Makeqanûnê di 25.06.2014an de biryara îxlalkirina azadiya vegotinê dabe jî ji hêla dadgehên heremî ve ji nû ve qedexa hatine danîn, Makeqanûn hatiye îxlalkirin.

B. Serîlêdanên di Dadgeha Mafê Mirovan ya Ewropayê de derdest bûne:

- 1- Hevdîtînen parêzeran yên di Girtîgeha Girava Îmraliyê de bi Birêz Ocalan re û kontrolkirina pergala înfazê çiqas girîng e serîlêdana bi hejmara **12261/10** ku ji AÎHMê re hatiye kirin derdixe holê. Lewra ev serîlêdan tekîldarê di sala 2008an de Birêz Ocalan di hîcreya xwe bi zorê erde hatiye dirêjkirin û bi mirinê hatiye tehdîtîkirinê ye. Giliyên ku ji dazgeriyê re hatine kirin bê encam mane ji bo vê encamê di 2010an de ji AÎHMê re serîlêdan hatiye kirin di derheqê vê serîlêdanê de hîn biryareke nehatiye dayîn.
- 2- Qedexeya parêzeran ya ku di sala heftan de ye di dîroka 27ê Tîrmeha 2011an de dest pê kiriye. Piştî qedexeya sê mehan di Cotmeha 2011an de li ser pêvajoyên serîlêdanên heremî bê encam man bi hejmara serîlêdanê ya **74751/11** ji AÎHMê re li ser navê Birêz Ocalan û 5 Muwekîlên ku wê demê li ber bûn serîlêdan hatiye kirin. Ligel di berdawamiyê de agihandin hatiye kirin û encama serîlêdanê hatiye pirsîn AÎHM div ê dosyayê de tu riyek nedîtiye.
- 3- AÎHM, darizandinên piştî ku Birêz Ocalan 1999an de bi komployeke ji Tirkiyê re hat radestkirin hikm kiriye mafê darizandina biedalet hatiye îxlalkirin. Qanûna muhakemeya Cezayê rêgeza 31emîn a ku mafê darizandina ji nû ve rêkûpêk dike bi taybetî ji bo bikeve pêşiya feydegirtina mafê Birêz Ocalan hatiye saz kirin. Ji bo bikevin pêşiya feydegirtina Birêz Ocalan di sala 2003an de ji bo îadeyamafên sedan dosyayên ku ji saz kirinê neyînî bandor bûne di dîroka 11.04.2013an de ji nû ve qanûn hatiye saz kirin. Lê belê divê saz kirinê de jî tenê sirf ji bo bikevin pêşiya feydegirtina Birêz Ocalan rewşa awarte hatiye dayîn. Kesekî pîvana wekhevîya makeqanûnê îxlal kiriye ji bo wî saz kirina qanûnê ya taybet li ser nikare bikeve pêşiya bikaranîna mafê darizandina ji nû ve ya Birêz Ocalan tekîldarê vê yekê ji bo serîlêdanên Dadgeha Makeqanûnê û Heremî bê encam mane serîlêdana bi qeyda **34836/16** ve serîlêdana ji AÎHMê re hatiye kirin ber dewame.
- 4- Di biryara AÎHMê di 18ê Adara 2014an de (**serîlêdana dosyaya bi pevghîştî bi hejmara : 24069/03, 167/04, 6201/06 û 104640707**) di bergeha rêgeza 3emîn a peymanê cezayê heta hetayê ji bo Birêz Ocalan hatiye dayîn û li gorî heta hebe li girtîgehê bimîne hatiye saz kirin diyar kiriye dijberê qedexeya miameleya xirab û cezayê derveyê mirovahiyê ye Tirkiyê mehkûm kiriye. Niha di girtîgehên Tirkiyê de sedan cezaxwarên girantirîn cezayê heta hetayê girtine hene. Piştî vê biryara AÎHMê

divê Hikumeta Tirkîyê vê cezayê dîsa li ber çavan derbas bike û wekî biryarên AÎHMê baştir bike lê heta niha gavekî neavêtiye. Pêwistiya vê biryarê bi hiqûqî encax bi rastkirinên qanûnî cezaya heta hetayê ji holê rakirin e. Tekîldarê vê babetê ji hêla berpirsiyarê şopandina biryarên AÎHMê yê parêzeran Komîteya Wezeretên AKê hewldan didomin. AK BK, vê biryara ku AÎHM tekîldarê Birêz Ocalan daye girtiye pêvajoya şopandinê. Ji Komîteya Wezîran re di dîrokên 06.06.2016 û 10.10.2016an de serîlêdanên ku bi nivîskî hatine kirin û ji bo divêtiyên biryarên AÎHMê bi cih werin di nav hewldanan de bin û piştî biryara îxlalê çar sal in Tirkîyê biryarên AÎHMê bi cih naîne daxwaza tespîtkirina vê yekê hatiye kirin.

VI. ENCAM

- Ji Girtîgeha Tîpa F ya Îmraliyê û ji muwekîlan 16 meh in bê navber agahî nayê girtin, qedexeya hemû riyên ragihandinê hevdîtin û agihî girtinê bi awayekî sistematîk didome.
- Pêvajoya OHALê ya li Tirkîyê, berpirsiyariya Tirkîyê ya netewî û navnetewî îxlal dike. Bi sedema pozisyona welatekî namzeta Yekitiya Ewropayê ye û nirxên demokratîk yên ku Ewropa girêdayîye û mafên mirovahiyê îxlal dike. Jixwe lewra ji hêla Şûraya Ewropayê ve di pêvajoya şopandinê de ye. Di serî de CPT û Şûraya Ewropayê berpirsiyariyên xwe wekî hewce dike bi cih binin tê zanîn ku ev yek ji bo derketina ji pêvajoya krîtîk a tê jiyîn ew ê bibe amûrê herî girîng.
- Encax CPT, pêşniyarên xwe yên ku di rapora berê de cih girtibû û pivanên li hemberî îşkenceyê xistibû holê jibîr kiriye. ligel ku mercên wî hene rapora serdana 28-29ê Nîsana 2016an naweşîne dîsa ligel mercên wî pêk tînin di rêgeza 10/2 emîn di Peymana li hemberî Îşkenceyê de cih digire daneya daxuyaniya rayagiştî bi cih naîne. Bi vê yekê rewşa agahî negirtina ji Girtîgeha Girava Îmraliyê de hatiye rewşa linge damezîner.
- Komîteya Wezîran a Şûraya Ewropayê, bi salan e Tirkîye biryarên AÎHMê pêk naîne, bi salan e ji bo îxlalên di biryarê de cih girtine ji holê were rakirin ligel ku rastkirineke zagonî çênekiriye nekirine tespîta rewşê , ji Tirkîyê re di mijara pêkanîna biryarên AÎHMê de werekî dide.
- AÎHM, bi qedexeya parêzeran ku şeş sal û nîvan dibine di derheqê serîlêdana pêkanîna tecrîda giştî dihûndirîne tu miamele nekiriye, bi tunehesibandina pîvangên mafên mirovan pîvangên hiqûqê bin pê dike. Encax di vê babetê de helwesta Tirkîyê ya li hemberî nirxên demokratîk yên Ewropayê û AÎHSê divê li ber çavan derbas nebe.
- Wezereta Dadê, bi Peymana Mafê Mirovan ya Ewropayê Komara Tirkîyê di çarçoveya Makeqanûnê de berpirsiyariyên hiqûqî û siyasî bi cih naîne.

- Wekî ku di hiqûqa navîn de divêtiyên hiqûqî bi cih nayê di çarçoveya hiqûq û demokrasiye de lêgerînên serlêdanên alternatîv yan bê bersiv hatine hiştin yan jî vala hatine derxistin.

- Biryareke Dadgeha Makeqanûnê ji hêla dadgehên heremî ve cara yekemîn di şexsê Birêz Ocalan de nehatiye nasîn û hatiye redkirin.

-Li hemberî biryara dadgeriyê binasiya bi dinyaya derve re veqetandina hemû tekîliyan hatiye nîşandan serlêdana ji Dadgeha Makeqanûnê re hatiye kirin tekîldarê vê yekê tu pêşveçûnek pêk nehatiye. AYM bandora li ser îxlalên mafê mirovan divê were diyarkirin di Tirkîyê de venêrîneke lawaz damezrandiye. Biryara 1 emîn Dadgeriya Înfaza Bûrsayê ku deriyên Îmralityê girtiye , wekî pêvajoya OHALê dike binasî AYM jî nekarîbûna venêrîna pêvajoya OHALê û KHKê ji hemû dinyayê re eşkere kiriye. Di vê rewşê de di diyarkirina welat de venêrîna zagonî nemaye asteng tune ye.

- Di dema ku pergala tecrîdê ketiye halê mayînde li ser Muwekîl Birêz Ocalan bi taybetî ji bo nasnameya wî ya polîtîk gelek nûçeyên diyar û nediyar derketiye holê. Ji bo kîjan armanc pêk tê bila pêk were; ji bo em bi Birêz Ocalan re hevdiîn pêk binin û agahiyek baş bigirin li hemberî hewldan û daxwazên me yên bê hejmar; Serdozgeriya Komara Bûrsayê, Îdareya Girtîgeha Girava Îmralityê, Dadgeriya Înfaza Bûrsayê, Lîjneya Şopandinê ya Girtîgeha Bûrsayê, Lîjneya Dozger û Dageran û Wezereta Dadê ligel berpirsiyariyên xwe yên zagonî gavekî erenî neavêtine. Di bergeha berpirsiyariyên Qanûnî û Makeqanûnî ev saziyên fermî yên ku me hijmart û mekanîzmayên zagonî bi binasiya venêrîna navnetewî û berpirsiyariyên darazî CPT û AÎHM bixwe bûne perçeyeke pergala ku di Girtîgeha Girava Îmralityê de pêkhatiye.

**BUROYA HIQÛQÊ ya
SEDSALÊ**